# Belgenameya
## *Hevkariya Demokrat a Sûrî*
Washington, 17 Çêriya paşîn / November 2003

## Ey kurên gelê me yê Sûrî…!

Tevî guhartinên dînamîkî yên, ku rûyê ramyarî yê cîhanê guhartine, di dehsalên dawiyê da ji sedsala pashîn, sazmana deselatdar li Sûriyê welêt hîn bi şêweyekî pirîmîtîv û li şûnmayî tevdigerîne. Bêguman sazmana deseletdar dibistanek zorkarî û zorbaziyê ye, ne fermandariyek sazmanî ya demokrat e.
Diyare, ku Sûriye hîn bêtir ber bi nebaşîyê ve diçe, û wê ciyên beydeqên ramyarî neyin guhartin eger gelê me yê sûrî wan ciyan neguhêre. Sazmana deselatdariyê li Sûriyê sazmanek bê rêbazî ye û bo wê bingehek zagonî an siniçî an jî mijareyî nîne, ji ber ku sazmanê xwe bi zor li ser rastîniya sûrî bi cih kiriye, bi revandina deselatdariya ramyarî, bi rêya hêzdarî û zorkirinê û bi serbinkirinek leşkerî.

Hêzên berevaniya (mua’reza) sûrî bi hêwirdanên xwe yên nûjen dijwariya rewşan di niştê me da, di siya deselatdariya tevayî ya yekanî û acetên wê yên zordariyê da dizane. Sazman biryarê di her tiştekî da li ser paşeroja gel û niştê me bi tenê xwe dide û zagona sivîl, avedaniyên rêbazî (destûrî) û zagonî bêkar kirine û hilbijartin kirine karin rûçikî, ku welat di hejarî û bêkariyê da bin ve çûye û bûye xarîna sazmanek aborî ya li şûnmayî.

Sazmana deselatdar naye rêformkirin an perçîmkirin an jî serrastkirin, lew re hêzên berevaniyê biryar bi giştî li ser bernameya karê hevpar dan û li ser lebatê bo avakirina sazmanek parlemanî ya azad û li ser rizgarbûnê ji pîrkebûsa dîktatorî ya malpêmayî. Hêzên berevaniya nûjen çareya karê xwe yê berevanî berçavkirin, bi dilxweziya aktîvkirina wî karî û hişdarîkirina terzekî ramyarî yê nûjen.

Hêzên berevaniya sûrî ên ku li Washingtonê li hev civiyane bang dikin bo kar, da van armancên xarê bên bi destxistin:

________________________________ Guhartina sazmana dîktator a malpêmayî bi rêka viyana gelê sûrî, û tunekirina bermayên wê û îlkirina hemî zagonên zordar ên, ku jê derketine.

____________________________________________ Averêkirina welêt bo rewşên rêbazî, bi rêya hilbijatinên azad û yekser di bin çavdêriyek navnetewî da, û bi dengdayîna veşartî, bo hilbijartina encumenek avakar, ku rêbaza herdemî (Destûrê) amade bike, diristkirina serîhejmartinek giştî di demek bêlîkirî da piştî roxandina sazmana deselatdar. Divê di wê hikûmetê da nûnerên hemî desteyên gelê sûrî bi giş hêzên xwe yên ramyarî hebin, ewên ku dixebitin bo Sûriye ya nûjen bikin azad û demokrat, divê kar û barên di vê peymanê da hene bibe serî:

1. Sîlkirina zagonên taybet (Qanûn Eltewarêi) û fermanên ne zagonî (Hukim Urfî) û avedaniyên hêminiya ramyarî ya zorbaz û arşîvkirina belgeyên wan, tunekirina rêç û şopên fermadariya dîktator di hemî waran da, derxistina beratkirinek giştî bo girtiyên raydar yên ku bi xwe zor bi kar ne înane û ziyanvedana wan ji ber karên sazmana zorbaz dij bi wan û liştên wan.

2. Sîlkirina ramyariya ji hev cihêkirina netewî, olî, desteyî û rêgahî, ku dij bi kurên gelê me yê sûrî hatiye pêdakirin, tunekirina rêç û şopên wan bi rêya amadekirina delîveyên wekhev ji hemî Sûriyan re di sergerandina welêt da, pêdakirina dadmendiya civakî û wekheviya rastîn di nav wan de, çi di warê mafan û çi di warê histobariyan da, dûrî her cihêkirinekê di giş waran da û bi cihkirina wê di rêbazê (destûrê) da.

3. Ji ber ku Sûriye welatekî pirnetew e, tê da li gel herdu netewên serekîn ya erebî û ya kurdî, gelek kêmjimarokên netewî û olî bi hev re dijîn, mafên netewî yên herdu gelên Erebî û Kurdî û yên hemî kêmjimarokên din di çarçiva yekbûna netewî ya sûrî da tên paristin û di destûra welêt da bi cih dibin.

4. Bi cih anîna vegera koçkiriyan, mişextiyan, bi dûrxistiyan û nebedkiriyan, bo welêt û ciyên rûniştvaniya wan ên berê, bi rêya rakirina giş proje û zagonên taybet (îstsnaî), ên ku li welêt hatine pêdakirin, û vegerandina dêrînên (mulkiyetên) wan ji wan re, û ziyanvedana ji wan re bi şêweyekî dadmend.

Azadiya tiqûsên (şea'êrên) olî û rêgahî, azadiya xebat û li sazxistina ramyarî û sandikatî û civakî, azadiya rojnamegerî, belavkirin, civang û rêveçûyîn û karberdana aştî, azadiya raydayîn û hişdarî û pejirandina pirlayaniya ramyarî, ji dest hev girtina deselatiya bi çareyên parlemanî li gor daxwaza piraniya gel, paristina mafên mirov li Sûriye li gor aşkeredana cîhanî ya mafên mirov, paristina rûmeta niştevan û mafên wî yên giştî û yên taybet, îmzekirina protokolên pê ve xistî û guhartinên di warê mafên mirov da hatine çêkirin, bi destxistina mafên afretê.

Xweşbingehkirina wateya niştevaniya sûrî bê cudahî, paristin û xortkirina yekîtiya netewî ya gelê sûrî, yekbûna komara sûrî ji aliyê zevîn û gel û kiyanê ve, ne dijber e bi wê rastiyê re, ku Sûriye welatekî pirnetew û- ol û deste û rêgahî ye, em bi yekbûna niştê sûrî û wekheviya di nav hemî niştevanêd wê de digirin, ev maf bi çi peyman û li hevhatinan naye sîlkirin an tunekirin, mafê serdestiya me li ser niştê me mafekî cîbecîkiriye, em ji dest nadin û jê danakevin.

Qedexekirina hemî şêweyên bi karanîna zorê, qedexekirina saziyên têrorî, ku kefteleftên xwe li Sûriye bikin, alîkarî li gel civaka navnetewî bo devliserkirina têrorîstan.

Bi rêxistina ramyariyek derveyî ya serbixwe û avakirina hevgirtinek îqlîmî ya rastîn bi hemî dewletên hevser re, li ser bingeha xalên serekîn ên hevjiyana aştiyane û bercewendiyên hevpar, xwegirêdana bi peymanên encumana Netewên Yekbûyî û zagon û urfên navnetewî yên li dar in, rêzgirtin li peymanên navnetewî, tevlêbûna aştiyê û paristina herêm û cîhanê, karkirin di nav kefteleftên civaka navnetewî da bo paristina jiyana derûdor (bîetê) û qedexekirina çêkirina çekên tevkujiyê û wêrankirina tevayî, xwe bi şûn ve kêşana yekser ji Libnanê û ji destxistina nav kar û barên wê yên hindirî, kar bo vegerandina Colanê û girêdana li hevhatinek herdemî bi giş dewletên hevser re, pêdakirina têkiliyên bazarganî û aborî bo bi destxistina hêminî û cîbecîkirinê, hevtewawkirina îqlîmî bo bercewendiya niştê sûrî.

Li darxistina ramyariyek sermiyanî ya azad, sîlkirina hemî biryarên Malstandina kesanî (Taimîmê) û zagonên zincîrker, li darxistina ramyariyek aborî ya diravmalî ya hişmend, piştvanî û destdayîn bo çandinê li ser bingehin nûdemî, lêgerîn li hinek parzeviyên aborî yên nûjen û dilxortkirina diravkirinan (îstîsmarat).

Rêformkirina şêwerêka tîmarkirinê - fêrkirinê li welêt ji binî ve.

Pêmijûlî bo avakirina leşkerê sûrî li ser bingehin dirist û hêja, bo ku ew bi sira xwe rabe di paristina niştiman da û paristina avahiyên rêbazî (destûrî). Rakirina xizmetê bi zor û nehêştina xebata partînî di nav rêzên leşker, hêzên hêminiyê û di nav polîs da.

Ji ber baweriya me bi van rastiyan û nahejên bingehîn û bi armancên bala ku di nav vê belgenamê da ne, emên ku me di bin da îmze kirine, soz didin, em rêz li xalikên wê bigirin, xwe pê ve girê bidin û ji bo bi cih anîna wan kar bikin û di çarçiva wê da hevkariyê bikin, em soz didin, ku dev ji wan bernedin, jê dernekevin, û derketin ji wê endametiyê di hevkariyê da tune dike.

Kongirê komîtiyek pêketin û hevsaziyê hilbijart, ku ji histobariyên wê ye têkiliyê li gel layên berevaniya sûrî yên, ku ne ketine nav hevkariyê, çêbike û ew pêşwaziyê li ber komîtiya serkariyê

dike bo pêdakirina hinek komîtiyên din, ew projeyên peymanên, ku ji hevkariyê derkevin, amade dike.

Deriyê îmzekirinê li ser vê belgenamê û tevlêbûna hevkariyê bo her kesaniyek giştî an zagonî ya sûrî, bi rêya komîtiya pêketin û hevsaziyê, vekirî dimîne.

Washington, roja yekşemê, 17ê Çêriya paşîn (November) sala 2003 z.